Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 393 nameronahi@gmail.com 11 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Hêza Parastina Minbicê mezin dibe





Beşdarbûna ciwanên herêmê di nava vê hêzên parastinê de zêde dibe. Piştî gefên êrîşan yên Tirkiyê li dijî bajarê Minbicê hejmara ciwanên ku berê xwe didin navendên Erka Xweparastinê zêde bûye.
Hêzên Erka Xweparastinê ya bajarê Minbicê weke mertala parastina bajêr a ji hemû êrîşên derve re tê destgirtin. Erka xweparastinê erkekî niştimanî, mirovî û exlaqî ye. Parastina welat û saziyên wê li gorî rêgez û nirxên demokratîk, mirovî, parastina civakê, jiyana hevbeş, wekheviyê ji bo avakirina civakeke demokratîk û azad erka her welatiyekî ye. Li ser vê bingehê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê di 2'yê mijdara 2017'an de qanûna pêkanîna erka xweparastinê da.
Piştî ku ev qanûn hate derxistin, ciwanên bajarê Minbicê û gundewarê wê yên ku temenên wan di navbera 18 û 30 salî de ne berê xwe dan navendên Erka Xweparastinê. Ciwanên ku cihê xwe di nava hêzên leşkerî yên weke Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Ewlehiya Hundirîn de digirin ev qanûn nagire nava xwe. Ji her ciwanekî bi dildarî tê xwestin ku beşdarî nava hêzên Erka Xweparastinê bibe û piştî ku deftera xwe ya leşkerî werdigire rasterast derbasî perwerdeyên girêdayî Hêzên Erka Xweparastinê dibe.
Piştî ku qanûn hate derxistin bi dehan ciwanên bajarê Minbicê û gundewarê wê yên hemû pêkhateyan berê xwe dan navendên Erka Xweparastinê û navên xwe qeyd kirin. Lê hin aliyên derve yên weke dewleta Tirk bi armanca derxistina tevliheviyan derew di nava welatiyên Minbicê de belav dikirin. Van aliyan bi riya belavkirina van derewan hewl dan projeya erka xweparastinê ya girêdayî Meclîsa Sivîl a Demokratîk a Minbicê têk bibin û rê li pêşiya beşdarbûna ciwanan bigirin. Lê ciwanên herêmê li hemberî van komployên Tirkiyê serwext bûn û bi israr beşdarî nava xebatên erka xweparastinê bûn.
Piştî ku hejmara ciwanên beşdar temam bû, Hêzên Erka Xweparastinê Akademiya Şehîd Umer di 22'yê Çileya 2017'an de yekemîn dewreya Erka Xweparastinê di bin navê dewreya Şehîd "Hisên Mihemed" de vekir. Di dewreya ku 45 rojan dewam kir de waneyên leşkerî û fikrî hatin dayîn.

### PIŞTÎ GEFÊN TIRKIYÊ BEŞDARÎ ZÊDE BÛ

Akademiya Şehîd Umer Nebo jî amadekariya pêşwazîkirina hejmara duyemîn a hêzên Erka Xweparastinê dike. Serdana ciwanên herêmê di van demên dawî de, bi taybet piştî ku dewleta Tirk gefa êrîşan li bajarê Minbicê xwarin, li navendên Hêzên Erka Xweparastinê zêde bûye. Niha hejmara ciwanên beşdarî Hêzên Erka Xweparastinê ya taybet ya Minbicê bûne 1000 leşker ku ji hemû pêkhateyan pêk tê, derbas kiriye.
Girêdayî mijarê Hevseroka Komîteya Parastin û Xewparastinê ya bajarê Minbicê Şîlan Silêman axivî û behsa qonaxên pêşketina Hêzên Erka Xweparastinê kir. Şîlan diyar kir ku piştî qanûna Erka Xweparastinê li Minbicê derket, ciwanên herêmê bi dildarî berê xwe dan navendên Hêzên Erka Xweparastinê. Niha jî hejmareke ciwanan berê xwe didin Akademiya Şehîd Hisên Mihemed da ku beşdarî dewreyên wê yên perwerdeyê bibin.
Şîlan Silêman di axaftina xwe de diyar kir ku Hêzên Erka Xweparastinê ya Minbicê ti carî destwerdaneke hêzên derve li herêmê qebûl nakin û got: "Dewleta Tirk bi hemû rêbazan hewl dide tevliheviyan li herêmê derxîne. Lê ciwanên herêmê bi van derewên Tirkiyê nayên xapandin û berevajî wê beşdarbûna ciwanan di nava hêzên Erka Xweparastinê de zêde bûye û diyar dikin ku dê bi hemû hêz û derfetên xwe parastina axa xwe bikin."
Hevseroka Komîteya Parastin û Xewparastinê ya bajarê Minbicê Şîlan Silêman bang li welatiyên Minbicê û bi taybet ciwanan kir ku beşdarî nava xebatên erka xweparastinê bibin û bi derewên ku aliyên derve belav dikin neyên xapandin...*ANHA*

## Her sal bi mîlyonan Masiyên Behra Wanê tên kuştin





Li Wanê, tevî ku nêçira masiyan vê gavê qedexe ye, rojane hema bêjin bi tonan masî bi rengekî qaçax têne girtin. Dewleta Tirk jî di bin navê pakkirina çem de masiyan diqelihîne.
Li Gola Wanê, ji 15'ê Nîsanê heta 15'ê Tîrmehê dema hêkkirinê ya masiyên Wanê (Încî Kefalî) ye. Lewma vê wextê qedexe ye ku masî bên girtin. Tevî vê qedexeyê jî hema bêjin her roj bi tonan masî bi rengekî qaçax tên girtin. Bi taybetî li navçeyên Erdîş û Bêgirê ku masî di vê demê de koçî van cihan dikin, tên qelihandin. Dewleta Tirk jî bi kepçeyan destekê dide vê komkujiyê. Li çemê Akkopru yê ji nava navenda Wanê derbas dibe, dewlet masiyan diqelihîne.
Saziya Karên Avê ya Dewletê bi navê 'pakkirina çem' de masiyan dikuje. Tevî ku dema hêkkirinê ya masiyan e, li çemê Akkopru karê 'pakkirinê' tê kirin û ev yek jî dibe sedema nerazîbûnan. Çemê Akkopru ku bi sed hezaran masî koçî wê derê dikin, ji ber 'karê pakkirinê' bûye herî. Serokê Komeleya Hawirdorê ya Wanê Alî Kalçik bi bîr xist ku mafê her zindiyên li nava xwezayê heye ku bijî û li ber komkujiya ku dewlet li masiyan dike, rabû. Kalçik diyar kir, bi navê parastinê, bi salan e masiyên Wanê tên qelihandin.

### LI ÇEMÊ AKKOPRUYÊ MASÎ TÊN QELIHANDIN

Kalçik da xuyakirin ku piraniya masiyan berê xwe didin çemên Delîçay, Zîlan û Bendîmahî, lê belê dewlet çavê xwe li masîgiriya qaçax a li van çeman digire û tedbîran nagire. Kalçik got, "Dema navbera 15'ê Nîsanê-15'ê Tîrmehê dema hêkkirina masiyan e û girtina wan qedexe ye. Lê belê li gel vê qedexeyê jî tedbîr nayên girtin. Dewleta ku ji bo parastina masiyan tedbîran nagire, li çemê Akkopru jî masiyan diqelihîne. Gelo di dema hêkkirinê de saziya Karên Avê ya Dewletê li çemê Akkopruyê çi karî dike? Ev karê tê kirin masiyê Încî Kefalî diqelihîne."

### DIVÊ EM XWEDÎ LÊ DERKEVIN

Kalçik ji her kesî xwest ku li ber vê yekê rabin û got, "Bi salane di bin navê parastinê de masiyê Wanê diqelihîne. Her sal bi milyonan masî tên kuştin. Îsal ji her wextê zêdetir e. Her roj bi tonan masî tên girtin. Em bang li gelê xwe dikin, bi taybetî gelê Wanê ji bo xwedî li vî nirxê xwe derkeve. Divê em êdî pêşî li vê komkujiyê bigirin."

## Şaredarî pirsgirêka kanalîzasyonê çareser dike




Li kolanên bajaroka Til Tewîl a girêday Hesekê pirsgirêka ava kanalizasyonê derketiye, şaredarî jî di nava hewldanan de ye pirsgirêkê çareser bike.
Li kolanên bajarokê Til Tewîl a nêzî 4 kîlometreyan bakurê bajarê Hesekê ye ava kanalizasyonan li kolanan kom bûye. Ev yek dibe sedema bîna genî û zêdebûna mêşûmoran. Metirsiya ku nexweşî di nava welatiyan de zêde bibe jî çêbûye.Rêveberiya Şaredariyê jî dibêje ku alavên wan nîne, lewma ew nikarin pirsgirêkê zû çareser bikin.
Endamê komîna Til Tewîl ê Ezîz Reşo derbarê mijarê diyar kir ku şerederî li gorî derfetên xwe tev digere û got: "Di xebatên xwe de pir kêm dimîne. Ev demeke dirêje xeta ava kanalizasyonê heye, lê derfetên wan a pêkanîna wê ji ber nebûna alavan kêm e.
Reşo, destnîşan kir ku 9 gundên girêdayî Şeradariya wan bi yek traktora berhevkirina çopê ye û wiha dewam kir: "Gelek alav ji şaredariyê re pêwîst in. Alav nîne, lewma em bang li Desteya Şaredariyan dikin ku alavên pêwîst ji şaredariyê re pêşkêş bikin."Hevserokê Şaredariya Til Tewîl Ciwan Ehmed jî derbarê mijarê de da zanîn ku pirsgirêka wan di aliyê alavan de heye û ev tişt anî ziman: "Bajarê Hesekê tenê sîtêrek avê heye, ev dibe asteng li pêşiya xebatên me. Di aliyê xizmetê de û çêkirina kanalizasyonan de em encex li gorî derfetên heyî tevbigerin."
Ehmed bang li Desteya Şaredariyan kir ku alavên pêwîst ji şaredariya wan re pêşkêş bikin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Desteyên Şaredariyan pêwîste derfetên ji şaredariyên me re zêde bike, ji ber herêma Hesekê fireh e û pêwîstî bi gelek alavan heye. Gelek rexneyên gelê me hene, lê em zêdeyî derfetên xwe nikarin tevbigerin."...*ANHA*




## Daxuyaniya hikûmeta Sûriyê erênî ye



Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê bi daxuyaniyekê diyar kir di encama lêgirînên leşkerî yên ji bo çareseriya aloziya Sûriyê de gelek rewşên xeternak derketin holê û destnîşan kir ku ew daxwaza dîyalogê ya hikûmeta Sûriyê erênî dibînin. MSD'ê wiha got, "weke Meclîsa Sûriya Demokratîk ji dema hatiye damezrandin ve, ji bo rijandina xwînê li Sûriyê raweste hewldanên me ji bo diyalogê berdewam dikin." *R-4*

## Em êrîşên Tirkiyê li ser herêma Kurdistanê qebûl nakin



Berdevkê Çapemeniyê yê Ofîsa Serokwezîrtiyê yê Iraqê Saîd Hadîsî têkildarî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ya li ser Başûrê Kurdistanê diyar kir ku Tirkiye herêma Kurdistanê bombebaran dike. Hadîsî got, "Ev tê wateya binpêkirina serweriya Iraqê. Mafê Iraqê heye ku serweriya xwe biparêze."*R-2*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 393 11- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

**Bi Kurdan re ne şer ne jî dostanî êdî nabe!**



*Ezîz KOYLUOGLU* *R-4*

# XEZEBA ZEYTÛNÊ WÊ LI SER WE BE



### XAYÎN WÊ HESABÊ BIDIN

Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên girêdayî wê piştî ku herêma Efrînê dagirkirin di kirinên xwe yên derveyî mirovî de sînoran nas nakin. Bi taybet di van kirinên xwe de jî kesên xayîn û xwe firoş bi kar tînin. Ev kesên xayîn yên ku ji aliyê dewleta Tirk de hatine kirrîn li dijî Kurdan bi her awayî zilm û zordariyê dikin. Weke ku di dîrokê de jî hatiye dîtin ev kesên xayîn hesabên kirinên xwe bi canê xwe didin.

### DIJMIN JÎ NIKARE XAYÎNAN BIPARÊZE

Fermandariya Giştî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê – Efrînê kuştina çete Ehmed Misto girt ser xwe. Fermandariyê got, "em ê hemû kesên xayîn ên di hembêza dagirkeriya Tirkiyê de tesfiye bikin. Em bang li hemû kesên ku hatin xapandin û beşdarî komployên qirêj ên dewleta Tirk bûne dikin ku ji van kiryarên qirêj vegerîn. Em dibêjin ku dagirkeriya Tirkiyê jî nikare wan biparêze." *R-2*

## Dagirkeran ji Efrînê derxînin





Endamên Kongra Star ên navçeya Til Rifet'ê a kantona Şehbayê bi daxuyaniyekê bang li Netewên Yekbûyî kirin ku destwerdanê li Efrînê bikin û dagirkeriya Tirk ji axa Efrînê derxîne. Jinan diyar kirin ku wan di derbarê kiryar û destdirêjiyên dagirkeran de belge amade kirine. Jinan got, "Em ê têkoşîna xwe li dijî dagirkeriyê berdewam bikin û Efrîna xwe ji destên dagirkeran rizgar bikin. "*R-3*

## Welatî bi kêfxweşî şervanan pêşwazî dikin




Welatî gelek kêfxweş dibin ku şervanên QSD'ê wan ji zilm û dagirkeriya DAIŞ'ê rizgar dike. Şêniyên gundên ku di hemleya Bagera Cizîrê de tên rizgarkirin bi kêfxweşiyek mezin û tilîliyan ervanên QSD'ê pêşwazî dikin. Welatiyan piştî sê salan ku hatin rizgarkirin kêfxweşiya xwe anîn ziman. *R-6*

## Jin li dijî zilmê bila dengên xwe bidin HDP'ê



Parlamentera HDP'ê ya Êlihê Ayşe Acar Başaran ku ji nû ve ji HDP'ê bû namzet diyar kir ku ji bo dema zilmê bi dawî bibe divê jin dengên xwe bidin HDP'ê. Ayşe got, "Em jin dikarin pergalek nû ava bikin." *R-3*

## 2 gundên din hatin rizgarkirin



Li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê gelê başûr ketiye nava tevgerê. Ciwanên welatparêz ên li dijî êrîşên dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê û bûn mertalên zindî diyar kirin ku ew ê rê nedin dagirkeriya Tirk. *R-2*

## 3 leşkerên Tirk hatin kuştin



Li bakurê Kurdistanê şerê di navbera artêşa Tirk û gerîlayên HPG'ê de giran dibe. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li Şemzînan û Qilabanê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku li Şemzînanê sê leşkerên Tirk hatine kuştin. *R-2*

## DAIŞ li Idlibê xwe birêxistin dike



Piştî tifaqa Astana ya di navbera Rûsya, Tirkiye û Îranê de çeteyên DAIŞ'ê careke din li Îdlibê ya ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk û Cebhet El Nusra de ye, xwe bi rêxistin dikin. Navenda Çavêdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê û yên El Nusra li Îdlibê şerê hev dikin. *R-2*

## Em ê nehêlin xewnên dewleta Tirk pêk bê



Welatiyên Çiyayê Qendîlê êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê şermezar kirin û diyar kirin ku wê axa xwe li hember êrîşên dagirkeriyê biparêzin. Welatiyan got, "Qendîl keleha berxwedanê ya çar parçeyên Kurdistanê ye. Dewleta Tirk dixwaze ne tenê başûr hemû Kurdistanê dagir bike." *R-5*

## Em rê nadin dagirkeriya Tirk



Li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê gelê başûr ketiye nava tevgerê. Ciwanên welatparêz ên li dijî êrîşên dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê û bûn mertalên zindî diyar kirin ku ew ê rê nedin dagirkeriya Tirk. *R-5*

## Şandeya Rojava li başûr hevdîtin pêk anî



Şandeyek ji Rojavayê Kurdistanê ku Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan, jî di navê de bû bi şandeyên başûrê Kurdistanê re civiya. Di hevdîtinê de Sarûxan, bal kişand li ser destwerdana Tirkiyê ya li axa Başûrê Kurdistanê û girîngiya yekîtiya gelê Kurd a li hemberî êrîşên li dijî kurdan anî ziman. *R-4*

## Dengek ji bo Demîrtaş, dengek Ji bo HDP'ê



Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî di çarçoveya xebatên hilbijartinê de li bajarê Tirkiyê Muglayê bi gel re civiya. Temelî wiha got, "'Hemû peywirdarên dewletê ji bo ku nehêlin HDP bendê derbas bike seferber bûne. Biçin dengê xwe bidin HDP'ê û Demîrtaş." *R-5*

## Divê gelên Suriyê bi hevre tevbigerin



Buroya Meclîsa Sûriya Demokratîk ya Helebê bi partiyên siyasî yên taxa Şêxmeqsûd re civiya û di civînê de pêşketinên li Sûriyê hat nirxandin. Partiyên Siyasî diyar kirin ku ji bo çareseriya aloziya Sûriyê pêdivî bi yekbûna pêkhateyên Sûriyê heye. *R-4*

# Ehmed Misto yê çete hat kuştin

***Fermandariya Giştî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê –Efrînê kuştina çete Ehmed Misto girt ser xwe. Fermandariyê got, "em ê hemû kesên xayîn ên di hembêza dagirkeriya Tirkiyê de tesfiye bikin.***

Fermandariya Giştî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê – Efrînê kuştina çete Ehmed Misto girt ser xwe.

Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê – Efrînê daxuyanî da û kuştina seçeteyê Koma "El-Cebha El-Şamiya" Ehmed Misto (Ebû Eslan El-Kurdî) girt ser xwe û detayên tesfîyekirina wî eşkere kir.

Daxuyaniya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê – Efrîn wiha ye:

"Dîrok diyar dike ku temenê dagirkeriyê kurt e û ne mumkine dirêj bibe, zû an dereng be dê dagirkerî fatureya sûcên xwe bide.

Di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, gelek çete derketin ku şîrê pîroz ê dayikê li ser şer û îxanetê rijandin, xwe avêtin himbêza dijminê Tirk, bi qasî ku dijmin zulm li wan kir wan jî zulm li ser gelê xwe meşandin. Ew kesanan rûmeta xwe winda kirin û serî ji dijminên hov re tewamdin.

Kesên ku em qala wan dikin, bi qirêjiya xwe nikarin feyde li gelê xwe bikin, piştî ku erka xwe li gel dijmin bi dawî bikin wê werin avêtin û şewitandin.

Li ser vê esasî, wekî Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê em li ser soza xwe ne ku em ê hemû kesên xayîn ên di hembêza dagirkeriya Tirkiyê de tesfiye bikin. Her wiha em berpirsyariya xwe li ser kuştina çete Ehmed Misto (Ebû Eslan) radighînin.

Şervanên me çend rojan tevgera çete Misto şopand, herî dawî di êvara 7'ê Hezêranê de kuştin, dema ku ji nuqteya xwe ya leşkerî ya li navçeya Mabata bi erebeya Jeep derdiket şervanên me ku tevgera wî dişopand li navenda navçeya Mabata yê kemîn jê re danîn gule lê reşandin, di encamê de hate kuştin û erebeya wî li ser rê qulipî.

Çete Ehmed Misto, ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê dijminahiya gelê xwe dikir. Ji roja yekê ve xwe xist hembêza dewleta Tirk, li wir ji aliyê MIT ve perwerde dît. Paşê wekî fermandarê Meydanî yê koma çete ya El-Cebha El-Şamiye li Daret Îza hate erkdarkirin. Çete Misto li Daret Îza çete perwerde kir û wan ji bo êrîşên li ser Efrînê sor dikirin.

Dema ku êrîşên barbar ên Tirk li ser herêma Efrînê, çete Ehmed Misto bi awayekî çalak beşdarî êrîşên li ser Cindirêsê û Şiyê bû.



Piştî dagirkirina Efrînê Misto berê xwe dide gundê lê jidayik bûye, Mîrka (Hesê). Li vir dîsa kiryarên xwe yên hovane, ji kuştin, revandin, heqaret, talankirin û koçberkirin…hwd li dijî gelê xwe berdewam kir. Ehmed Misto şêniyên gundê Meydan Ekbez ji malên wan derdixistin û li şûna wan malbatên çeteyan bi cih dikir.

Li ser tiştên ku me bi bîr xistin, em bang li hemû kesên ku hatin xapandin û beşdarî kompleyên qirêj ên dewleta Tirk bûne ku li van kiryarên qirêj vegerîn. Em dibêjin ku dagirkeriya Tirkiyê nikare wan biparêze."

## 3 leşkerên Tirk hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li Şemzînan û Qilabanê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:

### LI ŞEMZÎNANÊ 3 LEŞKER HATIN KUŞTIN

"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Agirî û Şehîd Pîroz de roja 9'ê Hezîranê saet 18:30'î li herêma Govendê ya navçeya Şemzînan a Colemêrgê, li dijî artêşa TC a dagirker ku li geliyê Girana rêya ewlekariyê çêdikir, çalakiyek kirin. Di vê çalakiyê de ji nêz ve derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin û 3 leşker hatin kuştin.

7'ê Hezîranê saet 10'an, hêzên me li qereqola Serbend a li navçeya Qilaban a Şirnexê xistin. Derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin, lê hejmara leşkerên mirî û birîndar nehat zelalkirin.

9'ê Hezîranê, artêşa TC a dagirker li derdora gundên Şapatan û Serero yên navçeya Şemzînan a Colemêrgê dest bi operasyonê kir. Operasyon 10'ê Hezîranê serê sibehê bi rengekî bê encam qediya.

### ÊRÎŞA BI BALAFIRÊN ŞER



Artêşa TC bi balafirên şer bombe li Herêmên Parastinê yên Medyayê barand. Li gorî vê yekê; 8'ê Hezîranê saet navbera 13:00-15:00 qada gundên Şerane, Sarkê û Bakirman ên herêma Gareyê, 9'ê Hezîranê saet 23'an geliyê Ermuş ê herêma Xakurkê, 10'ê Hezîranê saet 01:15'an derdora gundê Sitê yê herêma Zapê bûn hedefa bomberdûmana balafirên şer."

## 2 gundên din hatin rizgarkirin




Şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê, gundên Şemas û Hîlweyê ji çeteyên DAÎŞ'ê rizgar kirin.

Pêngava Bagera Cizîrê ya QSD'ê ku ji bo paqijkirina başûrê Hesekê dest pê kir, dewam dike. Pêşdeçûyçna şervanên QSD'ê berdewam dike.

Piştî şerekî dijwar, şervanên QSD'ê gundên Şemas û Hîlwe yên bi 18 kîlometreyan li rojhilatê Şedadê ne roja 9'ê Hezîranê rizgar kirin.

QSD'ê li gundên hatin rizgarkirin dest bi paqijkirina ji bermayiyên çeteyên DAÎŞ'ê kir.

## Artêşa Tirk êrîşî gundên Qendîlê kir



Balafirên şer ên artêşa Tirk a dagirker, herêmên Bokrîska û Dola Berana ên Qendîlê bombebaran kirin.

Van rojên dawî, gera balafirên keşfê yên li ser asîmanê herêma Qendîlê zêdetir bûye. Piştî ku ev çend roj in bê navber balafirên keşfê li ser herêmê digerin, gundewarên herêmê yên sivîlan rastî êrîşa balafirên Tirk ên şer hatin.

Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmî hatin girtin, balafirên şer ên artêşa Tirk a dagirker roja 10'ê Hezîranê saet di 11:00'î de derdora gundê Bokrîskan û herêma Dola Bedran bombebaran kirin.

Hate ragihandin ku di encama van êrîşan de bax, baxçe û zeviyên gundiyan zerer dîtine.

## Em êrîşên Tirkiyê li ser herêma Kurdistanê qebûl nakin

Berdevkê Çapemeniyê yê Ofîsa Serokwezîrtiyê yê Iraqê Saîd Hadîsî têkildarî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ya li ser Başûrê Kurdistanê got ku, "Ev tê wateya binpêkirina serweriya Iraqê, em qebûl nakin."

Berdevkê Çapemeniyê yê Ofîsa Serokwezîrtiyê yê Iraqê Saîd Hadîsî têkildarî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ya li ser Başûrê Kurdistanê daxuyanî da. Hadîsî diyar kir ku helwesta Bexdayê ya li hemberî vê dagirkeriya Tirkiyê eşkere ye û got, "Mafê Iraqê heye ku parastina serweriya xwe bidomîne. Tirkiye bêyî ku destûra Iraqê hebe, bi hinceta ku baregehên PKK'ê heye, Herêma Kurdistanê bomberdûman dike û leşkerên xwe sewqî herêmê dike. Ev tê wateya binpêkirina serweriya Iraqê. Em vê rewşê qebûl nakin."



## DAIŞ li Idlibê xwe birêxistin dike

Piştî itîfaqa di navbera Rûsya, Tirkiye û Îranê çeteyên DAIŞ'ê careke din li parêzgeha Idliba ku di bin dagirkeriya Cebhet El-Nusra de ye xwe birêxistin dike.Çeteyên DAIŞ'ê careke din li herêmên Idlibê yên ji aliyê Artêşa Tirk û çeteyên wê ve hatiye dagirkirin xwe birêxistin dikin. Navenda Çavêdirya Mafê Mirovan a Sûriyê derbarê mijarê de diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê li Idlibê serê 3 endamên Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) jêkirin. DAIŞ di bin navê Wîlayeta Idlibê sê kes serjêkirin. Dema serjêkirin pêk hat, cilên pirtuqalî li kesên serê wan hate jêkirin, hate kirin.Navenda Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê da zanîn ku serjêkirina sê kesan piştî şerê ku li gundê Kefer Hind a gundê Seqlîn a bakur-rojavayê Idlibê di navbera DAIŞ û Cebhet El-Nusra de derket pêk hat. Çeteyên Cebhet El-Nusra hin komên DAIŞ'ê bi tewana ku şaneyên razayî yên DAIŞ'ê ne 6 endamên wan tune kirin.

Li ser vê yekê di 4'ê Hezîranê de li bajaroka Silqîn a bakur-rojavyaê Idlibê şer derket. Şer di navbera çekdarên Cebhet El-Nusra û malbatek Iraqî ya girêdayî DAIŞ'ê derket. Di encamê de 27 kes ji wan 5 endamên Nusra ne hatin kuştin.Piştî toreya 9'an a civînên Astana ku di nîvê meha gulanê de hate lidarxistin, Rûsiya ,Tirkiyê û Îranê biryar dan ku parêzgeha Idlibê di bin berpirsyariya dewleta Tirk de bimîne. Ji wê demê ve nakokî, bûyerên şer, revandin û teqînan zêde bû…*ANHA*





# Komeleya Tirkmenan çandê pêş dixe

***Tirkmen yek ji pêkhateyên sereke yên herêm Minbicê ne. Komeleya Tirkmenan a bajarê Minbicê xebatan dike da ku çanda xwe biparêze. Endamê Rêveberiya Komeleya Turkmenan a Minbicê Fayiz Heyder diyar kir ku pêkhateya Tirkmen jî para xwe ji zordariya desthilatdaran wergirtiye ji mafên xwe yên çandî bêpar mabû.***

Komeleya Tirkmenan a bajarê Minbicê hewl dide ku kevneşopî û çanda tirkmen biparêze. Damezrandina Komeleyê bi rêya çalakiya destpêka ber bi vejandina çand û kevneşopiya Tirkmenan e Tirkmen yek ji pêkhateyên sereke yê bajarê Minbicê û gundewarê wê ye. Pêkhateya Tirkmen yek ji pêkhateyên kevn ên li herêmê ne û bandor li pêkhateyên din kiriye û ji wan bi bandor bûye. Di serdema serweriya rêjîma Baasê û dagirkeriya DAIŞ'ê de ev pêkhate jî weke pêkhateyên din ji mafên xwe bê par mabûn.

Komeleya Tirkmenan a bajarê Minbicê ku di 25'ê Nîsana 2018'an de hatiye avakirin û hewl dide ku di warê çandî û civakî de kevneşopiya tirkmenan ku ji aliyê sîstemên desthilatdar ve dihat paşguhkirin, biparêze.

Komele piştgiriya jiyana hevbeş di navbera pêkhateyan de dike.

Komele ji dema hatiye damezrandin ve di van sê mehên borî de gelek çalakiyên çandî li dar xistiye. Di nav van çalakiyan de gelek dewreyên fêrkirina zimanê zikmakî yê tirkmenî bûn. Kesên ji pêkhateyên ereb, kurd û yên din ku dixwazin fêrî zimanê tirkmenî bibin, beşdarî van dewreyan bûn.

Komele ji bo avakirina komeke hunerî ya taybet bi Tirkmenan di nava xebatan de ye û ji aliyê pisporan ve bi folklor û çanda tirkmenî tên perwerdekirin. Di komeleyê de rola jinan jî sereke ye û beşdarî fikra demokratîk û avakirina civaka xwe dibin û bi hemû hêz û derfetên xwe komeleya xwe pêş dixînin.




Piştî ku Komeleya Tirkmenan hate damezrandin ji aliyê dewleta tirk ve rastî astengiyan hat û daxuyanî da ku welatiyên tirkmen ên Minbicê beşdarî vê komeleyê nebin. AKP'ê bi armanca reşkirina komeleyê gelek derew li ser komeleyê belav dikirin û îdia dikir ku ew girêdayî kurdan e. Lê Komeleya Tirkmenan a Minbicê bi rêya çalakiyên xwe piştrast kir ku ew çand û kevneşopiya taybet bi tirkmenan diparêze.

Têkildarî mijarê Endamê Rêveberiya Komeleya Turkmenan a Minbicê Fayiz Heyder axivî û behsa armancên komeleyê û çalakiyên wê yên çandî kir.

Heyder di axaftina xwe de got ku bajarê Minbicê, ji mozayîkeke çandî ya pêkhateyan pêk tê û pêkhateya tirkmen jî weke pêkhateyên din para xwe ji zordariya desthilatdaran wergirtiye û ji mafên xwe yên çandî û zimanê xwe yê zikmakî bê par mabû.

Heyder destnîşan kir ku piştî Meclisa Leşkerî ya Minbicê bajarê Minbicê ji destên çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin, jiyana welatiyan di bajêr de xwezayî vegeriya û li ser bingeha projeya netewa demokratîk û afirandina jiyaneke hevbeş di navbera hemû pêkhateyan de dest bi xwebirêxistinkirinê kirin.

Heyder destnîşan kir ku dê bi hemû hêz û derfetên xwe fikra demokratîk û azad di nav welatiyan de belav bikin û dê civaka xwe ji hemû aliyan ve birêxistin bikin.

Endamê Rêveberiya Komeleya Tirkmenan Fayiz Heyder têkildarî fitne û fesadiyên ku tên derxistin wiha got: "Xebatên serkeftî ji hin aliyên desthilatdar ve her tim rastî êrîşan tên ji ber ku ne li gorî proje û berjewendiyên wan in. Armanca komeleya me birêxistinkirina welatiyên ji pêkhateya tirkmen li herêmê ye da ku di avakirina sîstema demokratîk û azad de bi rola xwe cih digirin."…*ANHA*

## Peykerên kesayetên navdar xirabkirine

Peykerên 34 kesayetên kurd li parka Mînare ya bajarê Hewlêrê hatiye çêkirin. Ji van 23 peyker xirab bûne. Rêvebirên projeya çêkirina peykeran destnîşan kir ku bi zanabûn difin û guhê peykeran hatine şikandin.

Rêvebirê projeya peykerê kesayetên bi nav û deng yên kurd Hawkat Riskin anî ziman ku kesên madeyên hişbir bi kar tînin û kesên qaşo oldar zirarê didin peykeran û wiha axivî: "Rêvebirên parkê li peykeran xwedî dernakevin. Sedemeke din jî ew e ku kesên bê kar û aciz dibin qehra xwe ji peykeran derdixin û zirarê didin peykeran."

Riskin da zanîn ku peykerên ku hatine çêkirin kesayetên bi nav û deng yên ji çar parçeyên Kurdistanê ne û bang li Hikûmet Herêma Federal a Kurdistanê kir ku li peykeran xwedî derkevin. Riskin da zanîn ku ev cara duyem e peyker tên şikandin.

Berdevkê Desteya Serbixwe ya Mafê Mirovan Mihemed Gumeşînî bêhurmetiya ku li hemberî kesayetên kurd hatiye kirin bi van hevokan anî ziman: "Li parkê peykerên bi dehan kesayetên navûdeng ên kurdan hene. Lê mixabin hatine şikandin. Bi şikandina difin û guhê peykeran nagihîjin armanca xwe."





## Dîroka defê kevnar e



Mamosteyê defê Sami Hosseini yê îranî dibêje ku def ji bo hin gelan pîroz e û ahenga hezkirin, aştî, serhildan û kêfxweşiyê tîne bîra mirov.

Dîroka defê pir kevn e û bi pêçiyên destan tê lêxistin. Amûreke muzîkê ye ku ji çermê ku li dora xeleka ji textî tê çêkirin ve tê pêvekirin. Dîroka defê diçe heta gelên wekî Sumer û Hîtîtê ku li Mezopotamyayê jiyan e.

Mamoste Sami Hosseini yê îranî ku bi hunera xwe di nav hunermendên defê de cihekî girîng digire, behsa dîroka defê kir û girîngî û wateya wê ya ji bo gelan anî ziman.

Hosseini diyar kir ku bi gelemperî gelên Rojhilata Navîn defê bikar tînin û bi taybetî di rojên kêfxweşî û xemgîn de tê bikaranîn û wiha got: "Dibe ku beriya şaristaniya Sumeran jî hatibe çêkirin. Bi demê re guherî be jî ehenga xwe wenda nekiriye. Tevî ku di wan deman de nota û qeydkirin tune bûye jî heta roja me ya îro jî hatiye."

Hosseini dibêje ku def bi taybetî bi jinan sembolîze bûye û bi ahenga xwe ahenga hezkirin, aştî, serhildan û di heman demê de coşê tîne bîra mirov.

Hosseini anî ziman ku erbane peyvek erebî û kurdî ye û got: "Em hunermend di warê akademiyê de bikaranîna erbaneyê rast nabînin. Ev nav navekî nû ye. Navê wê yê rastîn 'def' e ku peyveke îbranî ye. Def tê wateya dengê ku ji lêdan wê dertê û ji ber vê jî def hatiye gotin. Erbane jî têgehek nûtir e."

Hosseini li ser girîngiya defê ya ji bo kurdan sekinî û diyar kir ku def bûye perçeyekî jiyana kurdan. Hosseini da zanîn ku ji ber frekansa defê zêde ye mirov pir pê bandor dibe û motîvasyonê zêde dike û got: "Li Îranê berî ku li defê bê lêdan dest tê şûştin û dia tê kirin û piştre lê tê dayîn. Dikarin bêjin ku ev enstruman pîroz e."…*MA*



## Zimanê me nasnameya me ye

Derwêş M. FERHO

"Zimanê me nasnameya me ye." Mirov dema tê cihanê bi hin taybetiyan tê û hin taybetiyên din jî li gor çand û malbata mirov tê de ye tese digire. Li gor hin zanistên pedagojiyê fikirîn û ziman ji hev nayê cudakirin. Ango mirov çi zanibe wê difikire û çi difikire jî bi zimanê dizane rave dike. Ji ber vê yekê jî ziman pir girîng e.

Hugo Van Rompaey , di têza xwe ya doktora de behsa zimanê dayikê û şopa Kurdî dike. "Faktora herî girîng ziman e di çêbûna nasnamê de. Bingehê danûstendinê ye. Bi saya wêje û huner di ziman de meriv xwe, cî, derdor, civak, jiyanê bi giştî têdighe û pêşeroja xwe bi wî awayî ava dike. Li ser mijara şopa Kurdî jî behsa lêkolînên cuda dike. "Kurdî, xwedî dîrokeke kevn e. Di nasîna pêkhatina bingehê zimanên Indo-Ewropî de girîngiyek mezin ji bo dara "gurgan" yan jî "narewen" tê dîtin. Latîniya wê fagus e. Holandiya wê beuk e. Xuya ye ku ev nav nîşana hevparbûnekê ye.

Di Kurdî de jî heta niha behsa bikaranîna alfabeyên Avesta, Aramî, pehlewiya kevn, Masî-Soratî, Alfabeya ku Êzîdî di Kurdî de bi kar anîne, Erebî, Latînî û Kirîlî dike. Û di nava gotinê xwe de jî dubara "Kurdî yek ji zimanên herî kevn û herî zengîn e. Nasnameya Kurdan e." Di nava zimanên cîhanê de Kurdî jî yek ji yên herî xweş û dewlemend e. Xwedî dîrokek kevn û qewîn e. Ji ber vê yekê jî Kurdî ciqas liqasî zor û zehmetiyan bûye jî disa bi hemû dewlemendiya xwe heta roja me maye. Rehmetiyê Dr. Qasimlo di sohbetekê de li Brukselê weha got. "Li vê dinyayê sê zimanên mezin hene ku ez ji wan gelekî hez dikim. Ingilîzî, zimanê ticaretê ye. Frensizî, zimanê wêje (edebiyat) ye, Kurdî jî zimanê evînê ye. Di ti zimanên din de nabînim ku evîn weke di Kurdî de xweş were ravekirin."

Di dîroka pêkhatina neteweyetiya gelan de ziman her tim ciyekî girîng stendiye û gelek ji van gelan têkoşîna xwe ji bo nasnameya xwe di çarçeweya zimanê dayikê de dane. Flaman, Bask, Katalan, Bretûn, Welsch, û gelekên din. Flander, bi saya vê têkoşîna xwe di roja îro de serdestê îdara Beljîka ye. Bask û Katalan xwedî dezgeheke nîvdewletî ne. Dibe ku ev gel hê ne dewlet in, lê di roja îro de xwedî rûmetên mezin in ku goman ji hebûna wan di çarçeweya zagonî de nîne.

Di nava vê çarçewê de em li rewşa Kurdî binêrin. Kurd çi dikin û li pey çi ne? Gotina min li ser Bakuriyan e.

Li Bakur rewş ber bi malwêraniyekê diçe. Heta 20 salan berê Kurd pirranî bi zimanê xwe diaxivîn. Di navendên çend bajaran de jiyan bi Turkî bû lê li beşekî fereh kurdî zimanê jiyanê bû. Niha, Turkî ketiye nava gundan jî û Kurdî her diçe dibe zimanê civakeke piçûk. Derfetên perwerdê bi zimanê dayikê ji aliyê dewletê qedexe ne û astengiyên mezin ji bo projeyên taybetî hene. Kurd jî bi saya otoasîmîlasyonê dibin alîkarê vê malwêranîkirina zimanê xwe. Dewleta Turkiyê Kurdî qedexe û talan dike. Kurdên me, heta pirr kesên ku têkoşîna neteweyî dimeşînin evîndarê bikaranîna zimanê Turkî ne. Ji ber ku ew "nikarin xwe bi zimanê Kurdî îfade bikin." Li Ewropa em behsa 1,700 000 Kurd dikin. Çi keramet e ku li vê Ewropayê jî % 95 ji Kurdên Bakurî di jiyana xwe ya rojane de Turkî qonuşmîş dikin. Hade em bibejin li welêt nikarin di her warê jiyanê de bikar bînin û em xwe bixapînin li vir çi bi wan hatiye û zimanê xwe naaxivin. Mesele ev e ku em hîn zimanê (û xwe) bicûk dibînin. Ji aliyekî din de jî berjewendiyên me ji zimanê me nînin. Mînak gelek Kurdên me yên zimanê xwe nizanin diçin zimanên biyanî hîn dibin. Welleh, di warekî de em piçekî baş bûne. Navên Tugrul, Selçûk û Aslan, Abdullah, Muhammed, di civaka me de kêm bûna. Serdar, Tîrêj, Baran, Rêzan jî zêdetir tên bikaranîn. Ew jî heviyên me piçek be jî zindî dihêle.

# Goristana Şehîd Raxib tê sererastkirin

***Meclîsa Malbatên Şehîdan a navçeya Til-Hemîsê, Goristana Şehîd Rexib El-Atiye sererast dike. Li gorî rêveberan wê xebatên sererastkirinê heta 5 mehan berdewam bike. Goristana Şehîd Raxib El-Atiye di 13'ê Tebaxa 2017'an li gundê Salihiyê yê rojavayê navçeya Til-Hemîsê, hatibû vekirin.***



Meclîsa Malbatên Şehîdan a navçeya Til-Hemîsê, Goristana Şehîd Rexib El-Atiye sererast dike. Li gorî rêveberan wê xebatên sererastkirinê heta 5 mehan berdewam bike.
Goristana Şehîd Raxib El-Atiye di 13'ê Tebaxa 2017'an de li gundê Salihiyê yê rojavayê navçeya Til-Hemîsê, hatibû vekirin. 37 şehîdên YPG, YPJ û QSD'ê di vê goristanê de hatin veşartin.
Meclîsa Malbatê Şehîdan a Kantona Cizîrê ji 1'ê Gulanê ve, dest bi sererastkirina goristanê kirine.
Şaredariya Gel a navçeyê jî 47 şitil li goristanê çandin, 11 stunên elektrîkê danîn, li gorî şaredariyê elektrîk di heftiyek din de bighêje goristanê.
Meclîsa Malbatên Şehîdan bîrek avê li goristanê kola.
Rêveberên ku li ser xebatên sererastkirina goristanê disekinin diyar kirin ku wê heta 5 mehên din jî berdewam bike
Şehîd Raxib Atiyê, şervanek YPG'ê ji navçeya Til-Hemîsê ye. Di destpêka meha Tebaxa 2017'an di pêngava rizgarkirina Reqayê de şehîd dikeve. Şehîd Raxib yekem şehîdê ku li goristana navçeyê tê veşartin…*ANHA*

## Çîroka hostetiya Milfono



Milfono, ji beriya 50'î salî karê boyaxkirina cilan dike. Ji ber ku di karê xwe de serkeftîbû, li paytexta Elmanyayê Berlînê şaxeke boyaxkirina cilan vekir.
Ebdulbaqî Remedan, di nava civakê de bi navê Milfono tê naskirin, di sala 1963'an de ji birayê xwe yên mezin fêrî hostatiya boyaxkirina cilan bûye û heta niha di vê xebatê de berdewam dike.
Milfono bi Suryanî tê wateya Hoste, ji ber ku Ebdulbaqî cilên kevin boyax dikir û nû vedigerand, ew nav girt.
Ebdubaqî 2 salan li Helebê kar kir û piştre vegeriya navçeya xwe Dirbesiyê. Li wir bi alavên destpêkî (ûtiya bi komirê germ dibû) dest bi kar kir û her wiha boyax ji paytexta Sûriyê Şamê tanî.
Milfono, wiha got: "Em di beroşeke mezin de ava boyaxê heta nîv saetê dikelînin, piştre em cilan dixin wê avê û pê heta nîv saetek dikelînin. Piştî demekê em cilên boyaxkirî derdixin û dikin ava sar, bi vî awayî boyaxkirin bi dawî dibe."
Milfono li ser mijara ûtîkirina cilan di wê demê de wisa got: "Min ûtî datinî ser komirê heta germ dibû û bi perçeyek qumaş min ji ser komirê radikir û min cil ûtî dikir."
Milfono destnîşankir ku ew ji ber xwesteka xwe di 13 saliyê de fêrî vî karî buye.
Ebdulbaqî wekî ku ew kar ji birayê xwe fêrbûye, zarokên wî jî jê hînbûne û heta beşek li paytexta Almanyayê Berlînê vekirine…
*ANHA*

## Welatî bi kêfxweşî şervanan pêşwazî dikin



Şêniyên gundên ku di hemleya Bagera Cizîrê de tên rizgarkirin bi kêfxweşiyek mezin û tilîliyan pêşwaziya şervanên QSD'ê dikin.
Şervanên QSD'ê gundên El-Şemase, El-Hilwe û Ebû Hamda yên nêzî bajaroka Dişîşa ji çeteyan rizgar kirin.
Navenda Ragîhandinê ya YPG'ê nûçeyek ku dema şervanên QSD'ê ketin gundên girêdayî Dişîşa weşandin.
Di nûçeyê de behsa şêniyan tê kirin û hate gotin ku şêniyên gund bi kal, pîr, jin û zarokên xwe bi kêfxweşî û tilîlî pêşwaziya şervanan kirin. Şervanan jî silav li gundiyan kirin û bi wan re axivîn û bi wan re eleqeder bûn.
Şervanê QSD'ê Beşîr Mihemed ê cihê xwe di rizgarkirina gundên navborî de girtin ji navenda Ragîhandinê ya YPG'ê re axivî û diyar kirin ku şêniyên gund gelekî kêfxweş bûn û got: "Welatiyên gund bi dilgermî pêşwaziya me kirin."
Welatiyê bi navê Salim ku di nava gundiyên pêşwaziya şervanên QSD'ê kirin de diyar kir ku bi rizgarkirina gundên wan ji aliyê şervanên QSD'ê ve kêfxweşiyek mezin xistiye dilê wan û got: "Ev sê sal in û em di çemberê de ne. Zarokên me di nav tirseke mezin de dijîn. Ez niha zarokên xwe dibînim ku çawa bi kêfxweşî li nava gund digerin."
Çeteyên DAIŞ'ê welatiyên sivîl ên di gundên di bin dagirkiriya wê de mane, wekî mertalên zindî bikar tanîn.

## Rêyên Reqayê tên amadekirin



Komîteya Xizmetan a girêdayî Şaredariya Gel a Reqayê riyên taxa Meşleb ên zirar dîtibûn, sererast dikin.Ji ber wêranî û zirarên di riyên bajarê Reqayê de çêbûn, Şaredariya Gel a Reqqayê bê navber kar û xebatan dide meşandin.
Komîteya Xizmetguzarî ya Şaredariya Gel a Reqayê riyên Taxa Meşleb bi dirêjbûna 2 kîlometreyan amade kir. Riya hate amade kirin ji çerxeriya sûka hesen a li taxa Meşleb û ber bi sûka El-Makif Şerqî ya li taxa Rimêla ve hate amadekirin.
Komîteya Xizmetan a şaredariyê riyan li ser 2 qonaxan temîr dike, riyan rast dikin, û di qonaxa duyemîn de jî dê rê were qîr kirin.
Riya hate temîrkirin xwedî girîngiyek mezine, ew xeta ku taxa El-Meşleb û taxa Rimêla dighîne hev.Derbarê mijarê Endizyar Mihemed Ebdulqadir ku li ser xebatên amadekirina rê disekine destnîşan kir ku xebatên wan wê li ser du qonaxan pêk bên…
*ANHA*

## Şaredariya Minbicê bajar geş dike



Şaredariya Gel a bajarê Minbicê xebatên xwe yên girêdayî pêşxistin û geşkirina bajêr di hemû aliyan de bi rêk û pêk dimeşîne û projeyên xwe yên paqijkirin û xemilandina bajêr pêktîne.
Piştî ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bajar ji DAIŞ'ê rizgar kir, binesaziya bajêr ji nû ve hastesererastkirin û saziyên karûbarên xizmetguzarî û sivîl ên weke Şaredariya Gel hatin damezrandin.
Şaredariya Gel a bajarê Minbicê ji dema hatiye damezrandin ve gelek projeyên xizmetguzarî pêk anîn.
Şaredariyê bi hemû hêz û derfetên xwe xebatên xwe ji bo pêşxistin û geşkirina bajêr meşandin.
Di hundirê bajarê Minbicê de Şaredariyê gelek xebat dane meşandin û 3 çerxerê sererast kirin û li ser riya Cerblûs û Cezîrê çerxeriyeke nû ava kir. Her wiha parkên di bajêr de jî sererast kirin û toreyên av û kehrebeyê di van parkan de çêkirin.
Şaredariyê projeya sererastkirina kanalîzasyona bajêr bi baldarî da meşandin. Şaredariyê gelek rê û kolanên bajêr jî sererast kir û qîr kirin.
Girêdayî mijarê Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Minbicê Telal Îsa axivî û diyar kir ku Şaredariya Gel bi hemû hêz û derfetên xwe ji bo xizmeta welatiyan tevdigere û wê asta xebatên xwe ji bo xemilandina bajêr zêde bike.
Îsa bang li hemû welatiyan kir ku bi Şaredariya Gel re bibin alîkar û beşdarî xebatên pêşxistin û geşkirina bajarê xwe di hemû aliyan de bibin alîkar…*ANHA*

## Desteya Aborî alîkariyê dide cotkarên pembo



Rêveberiya Giştî ya Çandiniyê û berhemên sewalan a girêdayî Desteya Aborî ya Kantona Cizîrê wê simadê (gubre) ji bo zeviyên pembo bi deyn bide cotkaran.Rêveberiya Giştî ya Çandiniyê û Berhemên Sewalan derbarê mijarê biryarnameyek ji komîteyên xwe yên li herêma Cizîrê re şand. Di biryarnameyê de tê gotin ku wê semad bi deyn ji cotkaran re were dayîn û destnîşan kir ku ev gava wan bi aramanca piştgiriya berhemên pembo pêk hatiye.Di biryarnameyê de hate gotin ku ew ê di rewşa zehmeta a herêma Cizîrê de û ji ber girîngiya pêkanîna zeviyên pembo, rêveberiya giştî ya Çandiniyê Û Berhemên Sewalan qebûl kir ku semadê bi deyîn bide cotkaran di sala 2018'an de.
Simad wê li gorî van şert û mercan bide:1-cotkar di riya komîna gundê lê dimîne daxwaznameyekê ku ji aliyê meclîsê ve hatibe erêkirin û firehiya zeviyê tê de hatibe diyarkirin pêşkêş bike. Divê wêneyê nasnameya cotkar jî pê re be.2-Divê keşfa hesabkirinê ji aliyê komîteya çandiniyê ya herêma wî were çêkirin. Ew jî divê miqdara simadê ji wan re were diyarkirin.3-Divê cotkar soza ku wê berhemên xwe bide Rêveberiya Xweser bi awayekî nivîskî pêşkêş bike.4- ji her donimekê re wê 30 kîlo simada yorya were dayîn…*ANHA*



# Dagirkeran ji Efrînê derxînin

***Endamên Kongra Star ên navçeya Til Rifet'ê a kantona Şehbayê bi daxuyaniyekê bang li Netewên Yekbûyî kirin ku destwerdanê li Efrînê bikin û dagirkeriya Tirk ji axa Efrînê derxîne. Jinan diyar kirin ku wan di derbarê kiryar û destdirêjiyên dagirkeran de belge amade kirine. Jinan got, "Em ê têkoşîna xwe li dijî dagirkeriyê berdewam bikin û Efrîna xwe ji destên dagirkeran rizgar bikin. "***




Endamên Kongra Star ên navçeya Arfad (Til Rifet) a kantona Şehba bang li Netewên Yekbûyî kirin ku destwerdana xwe li Efrînê bikin û dagirkerê Tirk ji axa Efrînê derxîne. Jinan diyar kirin ku wan di derbarê kiryar û destdirêjiyên dagirkeran de belge amade kirine.
Kongra Star a navçeya Arfad bi daxuyaniyekê bang li Netewên Yekbûyî kir ku destwerdanê li Efrînê bike û rê li pêşiya destdirêjiyên dagirkeran bigire.
Endamên Kongra Star pankartên bi nivîsên weke "Hûn qêrîna jinên Efrînê dibihîsin?, na ji dagirkeriya Tirkiyê li Efrînê, na ji destdirêjiyên li dijî jin û zarokên Efrînê" bilind kirin.
Daxuyanî bi zimanên Kurdî, Erebî û Ingilîzî ji aliyê endama Kongra Star Ronahî şêxo, Şeyma Oso û Rîhan Mihemed ve hatin xwendin.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Di destpêkê de em hemû şehîdên azadiyê ku canê xwe fedayî parastina axa xwe kirine bi bîr tînin.
Her kes nas dike ku ji destpêka aloziya Sûriyê ve herêma Efrînê pêşwaziya hemû pêkhateyên Sûriyê kiriye û spartgeha herî bi ewle di Sûriyê de bû. Piştî ku artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê bi awayekî hovane êrîşî Efrînê kirin, bi sedhezaran welatiyên herêmê neçarî koçberiyê bûn. Dagirkeran di êrîşa xwe de binesaziya herêmê, deverên dîrokî, perestgeh û goristan armanc girtin.
Dagirkerê Tirk heta niha destdirêjiyên xwe li dijî welatiyên herêma Efrînê dike û mal û milkên wan talan dike. Her wiha gelek welatiyên herêmê hatine revandin û ji bo serbest berdin pereyan ji malbatên wan distînin. Di encama van destdirêjiyên dagirkeran de gelek malbatên ku vegeriyan malên xwe careke din neçarî koçberiyê hatine kirin.
Dagirkerê Tirk her wiha gelek malbatên ji Xuta hatine û dixwestin vegerin malên xwe rê li pêşiya derketina wan a ji herêma Efrînê digire û qedexe dike û bi hemû hêz û derfetên xwe hewl dide guhertineke demografîk li herêmê çêbike û li şûna malbatên resen ên Efrînê van malbatan bi cih bike.
Di çarçoveya van destdirêjiyan de herî zêde jin ziyanan dibînin. Tevî ku derfetên peywendiya bi van jinan re kêm in jî lê Kongra Star ji 20'ê Çileya 2018'an ve heta niha rewşa 154 jinan ên hatine kuştin, destdirêjiya wan hatiye kirin û hatine revandin belge kirine. Heta meha nîsanê 28 jin şehîd bûn û 99 jin birîndar bûn.
Jin ji ber rewşa koçberiyê di aliyên derûnî, aborî û civakî rastî astengiyên cûda tên. Em weke endamên Kongra Star a navçeya Arfad a kantona Şehba bang li Netewên Yekbûyî dikin ku destwerdana rewşa Efrînê bike û dagirkeran ji axa Efrînê derbixîne.
Em bang li hemû rêxistinên jinan û rêxistinên mafên mirovan dikin ku zextê li hikûmetên xwe bikin da ku rê li pêşiya destdirêjiyên li dijî jin û zarokên Efrînê were girtin.
Em bang li dadgeha navnetewî dikin ku komîteyekê ava bike û bi xwe van destdirêjiyên li dijî welatiyên Efrînê belge bike.
Em bang li jinên cîhanê dikin ku li dijî dagirkeriya Tirkiyê li herêma Efrînê alîkariya jinên Efrînê bikin.
Em bang li dezgehên çapemeniyê û kesayetên xwedî bandor û hiqûqnasan dikin ku piştgirî û alîkariya jinan li Bakurê Sûriyê bikin û li dijî dîktatoriya Erdogan tevbigerin.
Em ê têkoşîna xwe li dijî dagirkeriyê berdewam bikin û Efrîna xwe ji destên dagirkeran rizgar bikin. "

## Jin li dijî zilmê bila dengên xwe bidin HDP'ê



Parlamentera HDP'ê ya Êlihê Ayşe Acar Başaran ku ji nû ve ji HDP'ê bû namzet wiha got: "Ji bo em bêjin 'me demek zilmê bi hev re qedand' ez bang li hemû jinan dikim ku dengên xwe bidin HDP'ê û xwedî li dengên xwe derkevin.
Ayşe Acar başaran ku ji nû ve ji HDP'ê bû namzeda parlamenterıyê da zanîn ku divê ji sedî 50'yê meclîsê jin bin û wiha got: "Me bi awayekî zelal dît ku li cihê jin hene nêrîn û usluba mêr çawa diguhere. Di pêvajoyek wisa de di bin sîwana HDP'ê de meşandina xebatan rumetek mezin e. Me wek jinên TJA'ê li dijî qetilkirina jinan, girtina jinan têkoşîn da. Jinan têkoşîn bi bedelên giran mezin kirin. Me mîrateya dîroka têkoşîna jinan girtiye. Me pergala hevserokatiyê anî."
Ayşe di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku wan encamên mezin yên hebûna jinan a di meclîsê de dîtine û got: "Me wek jinan di mijara kuştinên jinan, newekhevî, îstîsmaran bi pêşnûmepirsan têkoşîna xwe kir yek. Bi HDP'ê re wê dîsa dengê jînan li Meclisê be."
Ayşe destnîşan kir ku gelê Êlihê mal bi mal digere û hev îqna dike û gelê Êlihê li dijî qeyûm bi berteke û wiha dewa, lor: "Gel dibêje 'riyên me ji zêr jî çêbikin, wê nebin piştevanên dijminê ziman û hebûna wan." Ayşeyê balkişand ser rakirina sindoqan jî û got ew ji bo hilbijêran bibin ser sindoqan wê her tiştî bikin, ger hewce bike wê bidin ser milê xwe û bibin.
Ayşe Acar Başaran di dawiyê de wiha got: "Em jin dikarin pergalek nû ava bikin. Bikaranîna dengan têr nake. Divê em xwedî li sindoqan derkevin. Hilbijêr ji bo bibin dildarên sindoqan dikarin serî li rêxistinên HDP'ê çapemeniya civakî bidin."

## Em destwerdana derve qebûl nakin




Meclîsa Jinan a Minbicê bi daxuyaniyek] diyar kirin ku ew destwerdana derve ya di karûbarê bajarê Minbicê de qebûl nakin û dan zanîn ku Tirkiye di nava hewldanên têkbirina aramiya herêmê û derxistina bê îstîkrarîyê de ye.
Meclîsa Jinan a Minbicê derbarê gefên dewleta Tirk de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de diyar kirin ku ew destwerdana derve di karûbarên bajarê Minbicê de qebûl nakin.
Daxuyanî bi beşdarbûna endamên Mala Jinan û Komîteya Aborî Ya Jinan ve li ber navenda Melcîsa Sivîl a bajar hate xwendin.
Daxuyanî ji aliyê Endama Komîteya Têkiliyên Dîplomasî Ibtîsam Ebulqadir ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de hate diyar kirin ku jinên Minbic û gundên wê komplo û îtîfaqa derbarê destwerdana dewleta Tirk di Minbicê de qebûl nakin û wiha hate gotin: "Ev itîfaq tenê ji bo binpêkriina aramî û istqrara herêmê hatiye kirin. Ew dixwazin berxwedana şêniyên Minbicê ya li dijî zulim û zordariyê derkevin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn dikarin ewlekariya herêma Minbicê biparêzin û wiha hate dewam kirin: "Em wekî jinên Minbicê itîfaq û komployên ku derbarê destwerdana karûbarê Minbicê qebûl nakin. Destwerdanên li kar û barên Minbicê re dagirkeriye."
Jinan di dawiya daxuyaniya xwe de destnîşan kirin ku ew dikarin parastina herêma xwe bikin û da zanîn ku ew armanca dewleta Tirk baş dizan in…

## Buroya Meclîsa Jinên Sûriyê tê vekirin

Komîteya Jinan a girêdayî Meclîsa Sivîl a Reqayê xebatên amadekariya vekirina navenda Meclîsa Jinên Sûriyê ber bi dawî ve dibe.
Piştî bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin xebatên rêxistinî hatin destpêkirin û gavên girîng hatin avêtin. Meclîs û komîteyên taybet hatin avakirin.
Di aliyê rêxistinî de taybet bi jinan jî gavên mezin hatin avêtin. Gelek sazî hatin avakirin. Ev yekem care ku jinên Reqa di hemû qadan de rola pêşengiyê dane ser milê xwe.
Jinên Reqayê niha amadekariya vekirina buroya Meclîsa Jinên Sûriyê dikin. Ev yek bi armanca ku jin bi xwe rêveberiya xwe bikin.
Derbarê mijarê de Endama Rêveber a Komîteya Jinan a Meclîsa Sivîl a Reqayê Feyrûz Xelîl anî ziman ku ji mehekê û vir ve ew amadekariya vekirina buroya Meclîsa JInên Sûriyê li Reqayê dikin û diyar kir ku di demek nêzîk de wê buro were vekirin.
Feyrûz, her wiha destnîşan kir ku armanca wan ji vekirina navendê ew e jin hêviyên xwe pêk bîn in û rola xwe ya xwezayî di nava civakê de bileyzin…*ANHA*

## Em destwerdana derve qebûl nakin



Piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, ji bo pêşketina civakê û siberojek azad gelek sazî û navendên perwerdeyê hatin vekirin. Niha jî Komîsyonên Jîneolojiyê wê di demên pêş de mamosteyan ji bo branşa Jînolojiyê perwerde bikin. Endama Komisyona Jîneolojiyê Sîmav Sofî da zanîn ku ji bo pêşketina hişmendiya civakê jîneolojî gelek girîng e û got: "Jîneolojî bingeha civakek azad û demokratîk e."
Li Rojavayê Kurdistanê ji bo perwerdeyê xebatên cur be cur tê kirin. Yek ji van xebatan ên girîng jî Perwerdeya Jîneolojiyê ye. Xebatên ku derbarê Jîneolojiyê de tê kirin ji bo civakê dibe çavkaniyek berbiçav. Endama Komisyona Jîneolojiyê Sîmav Sofî derbarê xebatên Jîneolojiyê de bi lêv kir ku Jîneolojî ji bo jin, zarok, ciwan û hemû civakê rêbazek lêgerîna heqîqetê ye û got: "Ji bo hişmendiya civakê bê guhertin divê mirov dîrok, xweza, erdnîgarî, rêbaza xwenaskirinê baş bizanibe. Di perwerdeya Jîneolojiyê de li ser van esasan guhertinek mezin di civakê de çê dibe û civak hem xwe nas dike hem jî pêş dikeve."
Sîmav Sofî diyar kir ku ew xebatên derbarê Jîneolojiyê de ji dil û can dimeşînin û got: "Sîstemên faşîst û mêtinger her dem li ser gelên bindest yekrengiyê ferz dikin. Bi taybet jî her dem mudaxaleyî nêrîn, îrade û nasnameya jinê tê kirin. Ji bo civakek azad û jina pêşketî divê Perwerdeya Jînolojiyê bi rêk û pêk bê berdewamkirin."

### GAVÊN GIRÎNG HATIN AVÊTIN

Sîmavê da zanîn ku bi destpêkirina Jînolojiyê de gavên gelek girîng hatin avêtin û wiha dewam kir: "Di warê pêşketin û perwedekirina civakê de jin xwedî roleke girîng e. Loma perwedeya Jîneolojiyê di milê jin û civakê de bû sedema gavên mezin. Loma niha jî em ê mamosteyan di warê biranşa Jîneolojiyê de perwerde bikin. Piştî Meha Remezanê mamosteyê du heyvan bên perwedekirin. Di vê perwedeyê de wekheviya jin û mêr dê esas bê girtin. Li ser esasên wekhevî û demokrasiyê mamosteyê perwede bibin û ji civakê re bibin mînakên baş."

### DIVÊ GIRÎNGIYÊ BIDIN PERWERDEYÊ

Sîmavê bang li hemû jinan kir ku girîngiyê bidin perwerdeyê û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Divê jin girîngiyê bidin perwerdeya Jîneolojiyê û xwe ji desthilatdariya baviksalarî rizgar bikin."…*Sorgul Şêxo/TILTEMIR*

# Daxuyaniya hikûmeta Sûriyê erênî ye

***Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD’ê bi daxuyaniyekê diyar kir di encama lêgirînên leşkerî yên ji bo çareseriya aloziya Sûriyê de gelek rewşên xeternak derketin holê û destnîşan kir ku ew daxwaza dîyalogê ya hikûmeta Sûriyê erênî dibînin.***

Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD girêdayî rewşa dawî ya giştî Sûriyê daxuyaniyek da û piştrast kir ku di encama hewldanên çareseriya leşkerî ya aloziya Sûriyê de metirsiyên mezin derketine.
MSD’ê diyar kir ku wan daxwaza Hikûmeta Sûriyê ya diyalogê bê dudilî qebûl kirine û daxuyaniyên hikûmetê erênî nirxadine.
Daxuyaniya MSD’ê wiha ye:
Heşt sal di ser şoreşa Sûriyê re derbas bû û ji ber hewldanên çareseriya leşkerî gelek encamên metirsîdar derketin û rewşa radîkalbûnê û parçebûna civaka Sûriyê zêde bû. Bi taybet koçberkirin, guhertina demografîk û destwerdanên hêzên derve hişt ku lihevhatinên di navbera aliyên Sûriyê de tune bibin. Atmosfêra radîkalbûnê geş bû û komên terorîst hatin avakirin û rojane kiryarên xwe li dijî hemû pêkhateyên Sûriyê dane meşandin. Êdî eşkere ye ku berxwedana li dijî vê diyardeyê gava yekemîn ber bi çareseriya Sûriyê ve ye. Ev gava li hemberî vê metirsiyê yekîtî ye, bi taybet ji ber ku ev diyarde çarenûsa welat û paşeroja wê têk dibe. Lê razemenîkirina di vê mijarê de û dijberiyên di navbera aliyên aloziyê de hişt ku teror geş bibe û çareseriya siyasî lawaz bibe.
Destwerdana hêzên derve ti çareserî ji aloziya Sûriyê re neanîn û rijandina xwîna welatiyên Sûriyê berdewam bû, tevî ku hin dewletan îdîa kirin ku dê aloziyê çareser bikin û şer bi dawî bikin. Sûriye ji aliyê Koma Astana ve weke herêmên serweriyê hate parçekirin, guhertina demografîk dane meşandin û hin herêmên ku di giştî aloziya Sûriyê de aram bûn, têk birin. Herêma Efrînê ku aram bû û pêşwaziya koçberan dikir, bi hevpeymanekê û kompleyên veşartî hate dagirkirin û yekîtiya axa Sûriyê xistin metirsiyê. Dagirkerên li Efrînê jî parçebûnê ferz dikin û cûdahiyê li ser bingehên mezhebî û nijadperestî dixin nava pêkhateyên civakê.
Aliyên Sûriyê nas kirin ku ne pêkan e çareserî bi rêbazên leşkerî pêk were û danûstandinên bi riya navbênkaran ti encaman bi xwe re nayne. Aliyên destwerdanê dikin jî li gorî berjewendiyên xwe alîkariya aliyekî ji van aliyan dikin, ji ber vê yekê divê çareseriya siyasî di navbera aliyên Sûriyê de bi awayekî rasterast esas bête destgirtin, da ku gelê Sûriyê karibe çarenûsa xwe dûrî destwerdanên derve diyar bike û rê li pêşiya parçekirina welat û razemenîkirina aloziya wê bigire.
Di vê çarçoveyê de û ji destpêka aloziya Sûriyê ve pêkhateyên Bakurê Sûriyê rêbazekî cûdayî herêmên din ên Sûriyê dane meşandin. Pêkhateyên Bakurê Sûriyê xeta sêyemîn di aloziyê de esas girtin û ji bo herêmên xwe ji şer û wêranê dûr bixînin xwebirêxistin kirin û rêveberiya xwe ya xweser ava kirin. Pêkhateyên Bakurê Sûriyê bi vê yekê karibûn aramiyê li herêmên xwe biparêzin û binesaziya herêmê biparêzin û aboriya xwe û rewşa civakên xwe pêş bixînin. Her wiha projeyên damezrêner ên avakirina sîstemeke demokratîk, piralî û nenavendî diyar kirin û kevirkoşeya avakirina Sûriya nû danîn.
Em weke Meclîsa Sûriya Demokratîk ji dema hatiye damezrandin ve, hewldanên me ji bo diyalogê berdewam in. Ji destpêkê ve nêrîna me ji bo çareseriya aloziya Sûriyê ew e ku tenê bi diyalogê çareser dibe. Di vê derbarê de em rastî çavbirçîbûna hin aliyan dihatin ku çareseriya leşkerî esas digirtin û daxwazên pêkhateyan ji aliyê rêjîma Sûriyê ve dihatin paşguhkirin. Her wiha paşguhkirina çareseriya demokratîk û israra mayîndina desthilatdariyê berdewam bû û ji hêzên civakî dixwaze ku xwe radestî siyasetên rêjîmê bikin an jî li hemberî şerekî leşkerî rû bi rû bimînin.
Me xwe bi van gefxwarinan re mijûl nekir û me ji bo şerê li dijî terorê xebatên xwe dane meşandin û herêmên ku rêjîmê ji terorê re vala kiribûn, me rizgar kirin. Dema ku hikûmeta Sûriyê daxuyaniya vekirina deriyê danûstandinan da, me bê dudilî û tavilê ev helwesta hikûmetê qebûl kir. Me daxuyaniyên hikûmetê yên ber bi hevdîtinên di navbera aliyên Sûriyê de erênî şîrove kirin, da ku derfeteke nû were peydakirin û guhertineke ber bi rawestandina lehiya xwîna welatiyên Sûriyê ve pêk were û xebatên peydakirina aramiyê û jinûve avakirinê bêne destpêkirin. Em hêvîdarin rêbazekî lihevkirinê were peydakirin da ku hemû nûnerên gel li hev bicivin û nêzîkbûna Sûrî Sûrî de pêk were û ji siyasetên tekalî û tunekirinê were dûrketin. Çareseriya Sûriyê bêyî hevgirtina hemû aliyên Sûriyê temam nabe da ku Sûriyeke demokratîk li gorî destûrekî ku hemû alî têde di erk û peywiran de weke hevûdu bin, weke avakirin.”

## Aqûbeta Gulen wê bê serê Erdogan



Muftiyê Amedê yê berê û Namzetê HDP’ê yê Rihayê Nîmetullah Erdogmuş, bal kişand ser aqûbeta serokê AKP’ê Erdogan û got: “Me tevan aqûba cemaeta Fethullah Gulen dît. Aqûbeta hat serê wan dê bê serê we jî.”

Parlamenterê HDP’ê yê Amedê ku niha Namzetê HDP’ê yê Rihayê ye Nîmetullah Erdogmuş, derbarê rewşa serokê AKP’ê Erdogan û zextên wî yên li ser cemaetê destnîşan kir ku tarîqat, cemaat û cemiyet ji bo xizmetê ji civakê re bikin hatine avakirin û wiha got: “Ger ku ev sazî rêxistinên hatine avakirin di xizmeta civakê de bin û li gorî rola xwe tev bigerin wê aştiya civakî her dem pêş bikeve. wê her dem di milê erênî de pirsgirêk çareser bibe. Lê ger ku ev sazî li gorî îktîdarê rola xwe bilîzin, wê demê wê perçekirin pêş bikeve. Wê civakê bikin kole û civak wê îteat bike.”

### ÊDÎ KES DÊ JI WAN BAWER NEKE

Erdogmuş, da zanîn ku îro cemaat û tariqat di xizmeta îktîdarê de ne û wiha got: “Îktîdar niha xetimiye. krizê dijî. Ev daxuyaniyên tariqat, cemaat û saziyên din ne daxuyaniyên wan bi xwe ne. Ev ji aliyê îktîdar û hevkarên wan ve tên arastekirin. Wekî fikrê wan dide nîşandan. Bi vî rengî biçin wê baweriya civakê ya li hemberî xwe winda bikin. Cemaata Fethullah Gulen jî wekî minaka vê yekê ye. Vê cemaatê bi xizmeta perwerdehiyê di nava civakê de hat qebûlkirin. Kengî îktîdarê û dewletê dest avêtê bi deh hezaran kes bûn mexdûrê cemaetê û îktîdarê. Wisa biçe dê aqûbeta Erdogan wekî cemaeta Fethullah Gulen be.”

## Şandeyek Rojavayî bi aliyên Başûr re hevdîtin pêk anîn



Şandeyek ji Rojavayê Kurdistanê bi şandeyên başûrê Kurdistanê re civiya. Şandeyek ji Rojavayê Kurdistanê ku ji Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan, Endamê Têkiliyên Doplomasî yê TEV-DEM‘ê Kamîran Mehdî, Hevserokê Nûnertiya Rojava ya Başûrê Kurdistanê Cawîdan Hesen pêk dihat serdana şandeyên Parlanamtoya başûrê Kurdistanê, jinên Kurdistanê û şandeya Oldaran ên li Başûrê Kurdistanê kirin.
Hevdîtin li avahiya Nûneretiya Rêveberiya Xweser a li bajarê Silêmanî pêk hat. Di hevdîtinê de, Ebdulkerîm Sarûxan pêşketinên siyasî girêdayî Rojava û Bakurê Sûriyê, nirxand.
Sarûxan, girîngiya yekîtiya gelê Kurd a li hemberî êrîşên li dijî kurdan destnşan kir, bal kişand li ser destwerdana Tirkiyê ya li axa Başûrê Kurdistanê û bêdengiya hikûmeta herêmê û diyar kir ku ji bo rawestandina zêdegaviyên Tirkiyê pêwîste xebatên hevbeş ji aliyê kurdan ve werin kirin.
Ebûlkerîm Sarûxan hevdîtin bi Endamê Kongreya Netewî ya Kurdistanê Taha Resûl re pêk anî. Resûl jî diyar kir ku pêwîste li hemberî êrîşên Tirkiyê Kongreya Netewî ya Kurdistanê were lidarxisitn û piştgiriya ji bo Rojava re berdewam bike..

## Divê gelên Suriyê bi hevre tevbigerin

Partiyên siyasî yên Helebê destnîşan kirin ku ji bo xelaskirina Sûriyê ji kirîzê pêwîste hemû aliyên Sûrî xwedî nêrîneke hevbeş bin û dest bidin hev. Partiyên siyasî gotin, “siyaseta dûrxistina aliyekî an pêkhateyekî Sûriyê aloziyê çareser nake.”Buroya Meclîsa Sûriya Demokratîk ya Helebê bi partiyên siyasî yên taxa Şêxmeqsûd re civiya. Di civînê de pêşketinên dawî hatin nirxandin.Civîn li avahiya MSD‘ê ya taxê hate lidarxistin. Nûnerên PYD‘ê, Hevbendiya Niştimanî û Partiya Sûriya Pêşerojê di civînê de amade bûn. Hevserokê Buroya Meclîsa MSD‘ê ya Helebê Mirî Şiblî geşedanên dawî yên li Sûriyê nirxand. Şiblî got, “Destwerdanên aliyên derve di karûbarên Sûriyê de bandoreke neyînî li ser gelê Sûriyê dike.”Şibilî, diyar kir ku rêbazên leşkerî çareseriyê pêşnaxe û got, “pêwîst aloziya Sûriyê bi rengekî siyasî were çareserkirin û gelê Sûriyê bêyî destwerdana derve çarenûsa xwe diyar bike. Armanc ji destwerdana derve parçakirina Sûriyê yê.”Mirî Şibilî, wiha dewam kir, “Tirkiye ji destpêka aloziya Sûriyê sînorê xwe ji koçberên Sûriyê re vekir da ku gelê wê bide koçberkirin. Paşê destwerda nava xaka Sûriyê. Herî dawî beşeke ji xaka Sûriyê dagirk kir û niha çavê wê li herêmên din e. Armanca Tirkiyê ew e ku îradeya gelê Sûriyê têk bibin.”Di dawiya civînê de, beşdaran jî nerînên xwe derbarê mijarê de anîn ziman û diyar kirin ku ji bo xelaskirina Sûriyê ji kirîzê pêwîste hemû aliyên Sûriyê xwedî nêrîneke hevbeş bin û bi hevre tevbigerin…***ANHA***



## Bi Kurdan re ne şer ne jî dostanî êdî nabe!

Ezîz KOYLUOGLU

Di nivisa xwe ya destpêkê de min hinek qala rewşa têkîliyên Rûsya û Îranê ku li Sûriyê wek dostên hev tên dîtin kiribû. Lê ev dostanî wê heta ku bidome kes nizane. Herkes dizane temenê vê dostaniya li ser berjewendiya kêm maye hilweşe. Ev mijara wê gelek bê nîqaş kirin. Lê di nivisa xwe ya îro de ez dixwazim hinek qala têkiliyên rejîma Sûriyê û Kurdan bikim.Têkiliyên Kurdan û rejîma Sûriyê ya niha ku xwe wek desthilatiya partiya BAAS pênase dike, ne şer ne jî dostanî bû. Heta niha jî bi rejîma Sûriyê re ne şer ne jî dostanî heye. Ev têkilî dem dem bi êrîşên rejîma Sûriyê re aloz dibe. Lê nazîvire rewşek jêneveger. Gel û pêkhatiyên li Rojavayê Kurdistanê dijîn, bi aloziya li Sûriyê re herêmên xwe xistin bindestê xwe û him parastin him jî rêveberiya xwe avakirin. Ev heft sale Kurd û gelên li herêmê bihevre di nav aloziya li Sûriyê ku têde kuştin, talan, xerabkirin, koçberî, birçîbûn hwd, heye, bi şêweyek aram û heta asteyek di nava refahê de dijîn. Çiqas kêmasiyê wê hebin jî, di rêvebirinê de heta asteyek demokrasî heye û temsîla her beşên civakê û gelan dinava rêveberiyê de heye. Ev jî bala herkesê dikşîne ser Rojava ku çewa di nava aloziya li Sûriyê de aramiyek û refahek wiha avakirin. Ev jî bi feraseta Rêberê Gelan Abdullah Ocalan ya civakê bû. Lê hêzên bi baldarî li Rojava dinêrin, naxwazin vê rastiyê bibînin. Ez rastiyek vê jî bêjim. Gelê Kurd û nûnerê wan ji destpêka aloziya Sûriyê de ku gelek hêzan dixwestin Sûriyê perçe bikin, gelekan dixwestin desthilatiyek radîkal avabikin, gelek hêzan wek dewleta Tirk jî hêzên wek DAIŞ birêxistin kir û kir bela serê mirovahiyê. Di demek wiha de kesî nizanibû wê li Sûriyê çi bibe, gelê Kurd û dostên wan ji xwe re rêyek diyar kirin û gotin em yekîtiya axa Sûriyê diparêzin û dixwazin Sûriyek demokratik û federal bê avakirin. Lê hedefa yekê demokratik kirina Sûriyê bû. Bi vê armancê Kurd û dostên wan hebûna rejîma Sûriyê li herêmên kontrol kir de, bi temamî ji holê ranekir û rê da ku rêyek diyalogê hebe. Gelek hêzên dixwestin rejîma Sûriyê ji holê rakin yan jî Sûriyê perçe bikin, ev nêzîkatiyên çareserî û diyalogê yên Kurdan wek piştgiriya rejîma Sûriyê dîtin û li dijî Kurdan şer îlan kirin û êrîşî Kurdan kirin. Pêla wan êrîşan ji Serêkaniyê destpêkir û herî dawî bi êrîşa dewleta Tirk ya dagirker ya li ser Efrînê dewam kir. Ez bixwe vê êrîşa dawî ya dewleta Tirk a dagirker li ser Efrînê jî dewamiya vê pêla êrîşa ku ji Kurdan re xwestin bêjin tu vê siyasete bimeşînî, em ê jî êrîşî te bikin, dibînim. Dibê bê gotin Kurd çima nebûn beşek ji perçekirina Sûriyê. Ev jî mijarekî nîqaşêye, lê hêzên li dijî rejîma Sûriyê jî mafê Kurdan yên netewî qebûl nedikirin û ev yek bi zimanekî eşkere digotin. Diyaloga Kurdan û rejîma Sûriyê û heta yê beşek jî oposîzyona rejîma Sûriyê jî her daîm hebûn. Niha jî ev diyalog bi rejîma Sûriyê re heta asteyekî didome. Lê ev diyaloga ku heye rewşa ne şer ne jî dostanî derbas nake. Sedemên ne derbaskirina vê rewşê hene. Ew jî siyaseta rejîma Sûriyê ye.
Rejîma Sûriyê, aloziya li Sûriyê wek demekî dibîne û li gorî xwe dibêje ew ê dîsa wek berê dewam bike. Yanî wê dîsa dewletek merkezî avabike û li gorî feraseta BAAS Sûriyê birêve bibe. Ev nêrîn û feraseta rejîma Sûriyê nahêle rêyek çareseriyê li Sûriyê vebe û hevdîtinên têkirin jî vala derdixe. Rejîma Sûriyê divê vê rastiya bibîne ku êdî netenê hin hêzên derve, ‘dostên’ wê yên wek Rûsya êdî perçebûna Sûriyê xistiye rojeva xwe û hêdî hêdî vê dike. Rewşa Îdlib, Efrîn, Ezaz, Bab, Cerablûs û Deraa vê eşkere dike. Rejîma Sûriyê bixwaze Sûriyê ji perçebûnê xelas bike, divê bi Kurda re li ser esasê dostaniyê dest bi muzakereyan bike. Yan na rewşa rejîmê wê aloztir bibe.



# Em rê nadin dagirkeriya Tirk

***Li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê gelê başûr ketiye nava tevgerê. Ciwanên welatparêz ên li dijî êrîşên dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê û bûn mertalên zindî diyar kirin ku ew ê rê nedin dagirkeriya Tirk.***

Ciwanên Başûrê Kurdistanê ên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk li Qendîlê bûne mertalên zindî, banga yekîtiyê kirin û gotin, “divê her ciwan li ber faşîzmê rabin.”
Ciwanên welatparêz ên li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê û bûn mertalên zindî destnîşan kirin ku çalakiyên wan wê bê navber bidomin.

### ÇALAKIYÊN ME WÊ BÊ NAVBER BIDOMIN

Baran Bermiyanî yê ji Kerkûkê diyar kir ku ji bo li ber dagirkeriya dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê ew li Qendîlê ne û got, “Em vê dagirkeriya ku bi salan e li ser xaka Kurdistanê dewam dike, şermezar dikin. Weke komên Mertalên Zindî em ê bi rengekî dorveger li Qendîlê çalakiya xwe bidomînin. Bang li tevahiya ciwanên Başûrê Kurdistanê dikim, ku ji bo careke din komkujî û şer li Kurdistanê rû nede, bi ruhê Efrîn û Şengalê beşdarî komên Mertalên Zindî bibin û axa xwe biparêzin.”

### EM XWEDÎ ARTÊŞA PARASTINA GEL IN

Huseyîn Kerkûkî jî destnîşan kir ku weke ciwanên Başûrê Kurdistanê wê ti carî li bermaberî vê dagirkeriyê bêdeng nemînin û ji bo parastina axa xwe heta dawiyê bi Qendîlê re bin. Kerkûkî got, “Pirsgirêk ne tenê êrîşên leşkerî yên li ser axa Başûrê Kurdistanê ye. Dewletên cuda îro bi rê û rêbazên curbecur hewl didin Kurdistanê dagir bikin. Ji hemû ciwanan re dibêjim; ji ti hêzên derve netirsin, ji ber ku em xwedî artêşa parastina gel in. Heta ku ev hêz hebe, wê gel parastî be. Ji ber ku yekane armanca vê hêzê, parastina gelan e. Li Başûrê Kurdistanê hin kes hene ku PKK’ê tenê weke tevgereke ji bo parastina gelê Bakurê Kurdistanê dibînin. Ev nêrîn gelekî şaş e. PKK ji bo tevahiya gelê Kurdistanê têdikoşe. Em dikarin bêjin, PKK ji bo yekbûna tevahiya gelên cîhanê hewl dide. Lewma divê ciwan jî ji bo vê hêzê piştgiriyê bikin û axa Kurdistanê biparêzin.”



### JI BO WELAT TEVLÎ ÇALAKIYAN BIBIN

Ciwanê bi navê Hoşeng jî ku di nava karê çand û hunerê de cih digire, li ser armanca çalakiya xwe got, “Weke xebatkarên çandê em îro li Qendîlê di nava Koma Mertalên Zindî de cih digirin. Ne tenê rojek an jî du rojan, eger pêwîstî pê heb em ê heta bi hetayê welatê xwe biparêzin. Bang li hemû ciwanan dikim, bê ku cudabûnê di nava partiyan de deynin, tenê li welatê xwe bifikirin û wê rawestan tevlî çalakiyan bibin.”

## Erogan wê here, lewma ne li ser hişê xwe ye



Parlamenterê HDP’ê yê Çewligê û namzetê Amedê Hişyar Ozsoy li Çewligê di dema fitarê de peyivî û diyar kir, karê ku wan 7’ê Hezîranê dest pê kirin wê 24’ê Hezîranê biqedînin.

Partiya Demokratîk a Gelan HDP bi rengekî berfireh li Çewligê dixebite. Namzetên HDP’ê yên Çewligê Erdal Aydemîr, Nîhat Aksoy, Şefîka Dogan û rêxistinên bajar û navçeyên Solxan, Kanîreşê û Dara Hênê bê navber dixebitin. Bi wesîleya meha Remezanê li Yeşîl Vadî ya li navenda Çewligê xwarina fitarê hate dayin. Alîkara Hevserokên DBP’ê Hacer Ozdemîr, Parlamenterê Çewligê yê HDP’yî û namzetê Amedê Hişyar Ozsoy û bi dehan kes tevlî merasîmê bûn.
Hişyar Ozsoy bal kişand ser tirsa Serokê Giştî yê AKP’ê Tayyîp Erdogan a ji Demîrtaş û got, “Bi hilweşandina hiqûqê re Demîrtaş dîl girt, lê hê jî jê ditirse. Hewl dide Demîrtaş nebaş nîşan bide. Xuya ye Demîrtaş li nava çar dîwaran jî wî bêzar dike. Erdogan ê çûyinê ye, lewma ne li ser hişê xwe ye.”
Ozsoy destnîşan kir, wê karê ku 7’ê Hezîranê dest pê kir û nîv hişt, 24’ê Hezîranê biqedînin. Ozsoy bal kişand ser Îdrîs Balûken jî ku 9 sal cezayê girtîgehê lê hatiye birîn û got, “Îdrîs wê ji girtîgehê derkeve û siyasetê bike. Lê belê cihê Erdogan di paşeroja Tirkiyê de nîne.”
Ozsoy li ser ewlekariya sindoqan jî hin hişyarî kir û bang li gelê Çewligê kir ku di hilbijartinên 24’ê Hezîranê de bi erk û berpirsyariya xwe rabe.

## Ji bo Penahî kampanyaya azadiyê

Rejîma Îranê, biryar dabû ku girtiyê siyasî yê Kurd Rehîm Hisên Penahî, piştî cejnê darve bike. Bertekên li hemberî vê biryarê zêde dibin.
Rejîma Îranê, heta niha gelek siyasetmedar û kesayatiyên Kurd darve kirine. Yek ji van jî girtiyê siyasî yê Kurd Ramîn Hisên Penahî ye.
Rejîmê biryar dabû ku Penahî piştî cejnê bi darve bike. Li hemberî vê, li ser tevna civakî kampanyaya bi navê #RahimHosseinpanahi #SosRahim hastag hatî destpêkirin, li Rojhilatê Kurdistan û çar aliyên cîhanê deng veda. Ji bo rawestandina darvekirina Penahî li Rojhilatê Kurdistan û çar aliyê cîhanê bang û çalakî pêk tên.
Ji bo girtiyê siyasî yê Kurd Penahî, li bajarê Koln ê Elmanyayê çalakiyek hate lidarxistin. Çalakvanên xwestin ku darvekirina Penahî bê rawestandin, dirûşmeyên “Em bibin dengê penahî!”, “Ji darvekirina Penahî re na!” hatin berzkirin.




Her wiha pankartên li ser wan, “Azadî Ji bo girtiyên siyasî”, “Em darvekirinê naxwazin” hatin vekirin.
Rêveberên girtîgeha Sineyê, di 19’ê Gulanê de ji malbata Penahî re ragihandibûn ku wê piştî cejnê Penahî darve bikin.

## Em ê nehêlin xewnên dewleta Tirk pêk bê

Şêniyên Qendîlê yên tevlî xwarina fitarê ya Şaredariya Qendîlê bûn diyar kirin ku wê axa xwe ji dagirkeriya dewleta Tirk biparêzin.
Şaredariya Qendîlê li mizgefta mezin a Qendîlê xwarina fitarê da welatiyan. Bi sedan kesî li mizgefta mezin fitara xwe kirin. Girseya gel êrîşên faşîzma AKP-MHP’ê yên li ser Başûrê Kurdistanê şermezar kir. Welatiyan gotin, wê axa xwe ji êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk biparêzin.

### RIZGARIYA GELÊ KURD BI YEKÎTIYÊ DIBE



Mele Îbrahîm beriya fitarê axivî û destnîşan kir ku armanca dewleta Tirk ne tenê Başûrê Kurdistanê ye, ew dixwaze çar parçeyên Kurdistanê dagir bike. Îbrahîm bi bîr xist, Qendîl a ku ji berê ve qada berxwedanê ye, her tim bûye hedefa faşîzmê û got, “Gelê li vê herêmê ji bo xwedî li dîrok û paşeroja xwe derkeve, divê îro jî bibe yek. Em bi hev re pêşî li êrîşên dewleta Tirk bigirin. Qendîl keleha berxwedanê ya çar parçeyên Kurdistanê ye. Rizgariya gelê Kurd bi yekîtî û hevgirtinê dibe.”

## Dengek ji bo Demîrtaş, dengek Ji bo HDP’ê



Hevserokê HDP’ê Sezaî Temellî li navçeya Mîlasê ya bajarê Tirkiyê Mûglayê bi gel re hate cem hev.

Hevserokê HDP’ê Sezaî Temellî li Mîlasê ya Mûglayê bal kişande ser nakokiyên di navbeyna AKP-MHP’ê de û got, ‘Tifaqa Cumhur’ ketiye nav pevçûnan. Temellî politikaya AKP-Erdogan a pêvajoya ber bi 7’ê Hezîranê ve bi bîr xist û got niha dîsa bi heman rêbaz û zimanî dertên pêşberî wan. Temellî got dema ku fêhm kirin wê nikaribin HDP’ê di bin bendê de bihêlin niha jî dest bi halan şer kirine. Temellî got : ‘’Hemû peywirdarên dewletê ji bo ku nehêlin HDP bendê derbas bike seferber bûne. Ji trafîkê bigirin ta bi têkoşîna dij terorê hemû rabûne ser piyan. Derd û kulê wan ew e ku HDP siyasetê neke. Hemû walî propagandaya AKP’ê dikin, li navçe û gundan digerin gefê li gel dixwin.’’
Hevserokê HDP’ê Sezaî Temellî bal kişande ser giringiya xwedîderketina li sendoqan û got, ‘’Ji niha û şûn de em ê hemû bibin müşahit. Em ê tenê dengên xwe nedin. Em ê li aqûbeta wê jî bipirsin. Zarok demokrasî û aştiyê dixwazin. Divê em li siberoja zarokên xwe xwedî derkevin. Ji bo demokrasiyê dengek ji bo Demîrtaş, dengek ji bo HDP’ê. Nebêjin dengek qîmetê wê nîn e, biçin dengê xwe bidin.’’



## Li Ewrûpayê lîderiya Macron

Burhan ERDEM

Di van demên dawî de lîderiya Serokomarê Fransayê Emmanuel Macron gelekî tê pijandin. Pêşiyê wî bi Fransiyan dabûn qebûlkirin û piştre jî bi Ewrûpayê. Jixwe yê bibe lîderê Ewrûpayê, êdî dibe lîderekî cîhanî.Ji me re gelekî dihate gotin ku, li welatên Ewrûpa ji ber demokrasiya pêşketî, hewcedariya ji lîderan nîn e. Lê di bingeha xwe de, lîderiya li Ewrûpayê her hebû. Di dema şerê duwemîn ê cîhanê de,(û tabîî beriya wê jî) ev lîderî di destê Brîtanyaya Mezin de bû.Navê herî li pêş ku di hişan de maye; Winston Churchill e. Lê piştî ku hegemoniya Brîtanyayê ji DYAyê re hate hiştin û Ewrûpa bi Plana Marshallê re hate muhtackirin, li parzemîna kevn lîder nîn bû. Heta ew fikrê kirina hêzeke yekgirtî ya dewletên sereke. Ji vê re jî lîderiyek lazim bû.Jixwe yê Ewrûpa kiribû Yekitiya Ewrûpa ew lîderî bû. Serkêşî jî di destê Fransayê de bû. Yê ku dixwest Ewrûpa di nava hêzên super ên cîhana me de cihê xwe bigre Charles de Gaulle bû. Wî gotibû ``ji Atlantîk heta Ûralan Ewrûpa``. Jixwe di dema Serokomariya wî ya Fransayê de temelên yekitiyê hatibû avêtin. Wî bi çûyina xwe ya Almanyayê şerê salan bidawî kiribû û lîderiya Fransayê ya Ewrûpayê bi Almanyayê dabû qebûlkirin. Piştî wî jî Serokomarên Fransayê François Mitterand û Jacques Chirac bi derxistina pêş a berjewendiyên giştiya Ewrûpayê vê lîderiya xwe nîşanî temamiya cîhanê dabûn. Nicolas Sarkozy yê piştî Chirac bû Serokomarê Fransayê dawî li vê serkêşiya Fransayê anîbû. Li kêleka wî jî şirîka wî Şansolyeya Almanyayê Angela Merkel Sarkozî berê Ewrûpayê dabû DYAyê. Rola Ewrûpayê ya ji bo şerê Iraqê leyistibû, bi van lîderan jî bi dawî bûbû. Êdî helwesta serbixwe ya Ewrûpayê, bûyina hêzeke super a Ewrûpayê tenê di xiyalan de mabû. Yên xwediyên van xiyalan xwe dabûn benda zayina lîderekî û berê wan li Fransayê bû. Namzetê vê lîderiyê jî Serokomarê Fransayê François Hollande bû. Hollande gelek hêvî dabû van derûdorên Ewrûpaparêz . Lê belê Hollande nekanîbû bibe bersiv.
Heta sala borî ew lîderê tê xwestin ê Ewrûpayê Macron hate ser dikê. Bi bûyina xwe ya weke Serokomarê Fransayê yê herî ciwan, herwiha yê herî Ewrûpahez Macron her hêvî dide. Lewa êansa wê ye ku, lîderê herî jê nayê heskirin ê Amerîkî, li Qesra Sipî rûdine. Hebûna Trump a li hemberî Macron, dihêle ku piêtgiriya jê re zêdetir bibe. Di dema guftugoyan de -ku ya herî balkêş zêdekirina baca gumrukû ya berhemên metalurjiya Ewrûpayê bû- bi Trump re hagtina wî ya cem hev û desthejandina wî ya Trump, aliyên medyatîk ên lutkeya G7an bû. Lê li wêderî Macron kir ku her şeş welatşn dewlemendên cîhana me, lêderiya wî ya Ewrûpayê hîs bikin. Angela Merkel êdî li dû wî mabû.Ev wayina lîderiya nû ya Ewrûpayê Fransayê ji Kurdan re ji ya Almanyayê gelekî baêtir xuya dike. Ez gotina gelekî binê wê xêz dikim û dibêjim. Lewre Kurdan gelekî ji Almanyayê kişand. Lewra ji sala 2005 an û vir ve siyqsetq Almanyayê her dij-kurd bû. Û vê siyaseta li ser dijberiya kurdan bi welatên din ên Ewrûpayê jî dida qebûlkirin. Herî kêm, bi lîderiya Macron a Ewrûpayê wê ev tesîra Almanyayê bişkê. Macronê ku piştgiriya Kurdan qebûlkir û bersiva vê jî da, dikare bandorê li hemû Ewrûpayê bike.